Kurdisch

Kurte agehdariyén jibo Misogeriya Berpirsiyariya Kesayetî

Misogeriya Berpirsiyariya Kesayetî (Sîgurta Şexsî) ji her tiştî péwîstir e. Péwiste ya her kesî hebe!

Dema ku tu li Elmaniya béhimid tiştekî xera bike yanî jî bişkîne, tu mecbûrî xısara xwedané wé lé vegerîne. Dema tu kesekî béşîne yan jî wî birîndar bike péwiste tu bihayé textorî û éşa wî bigre ser xwe.

Weku mînek, heger te bi Biskilété xwe boyaxa Terembéla (Ereba) kesekî xera kir, xwedané Termbélé wé terembéla xwe bibe cem Hoste çéke û tu mecbûrî xisara wî bidî.

Yan jî heger te Biskilét ajot û bi biskilété xwe ajot ser kesekî û ew birîndar bû, tu yé mesrefa Nexweşxaneya wî bide û dîsa jî tu mecbûrî pereyé békariya wî jî bigrî ser xwer.
Belkî giliyé pereyé éşa xwe jî li te bike.

Dibe ev yek gelek Pere bike û belkî tu li seran serî jiyana xwe xisaré bidî.

Ji bo ev xeter(metirsî) çénebe, li Elmaniya, ya jé re dibéjin Misogeriya Berpirsiyariya Kaseyatî heye, û her yekî Elman ji xwe re çédike.
Misogeriya Berpirsiyariya Kesayetî evé xisaré (mesrefé) digre ser xwe.

Tu dikarî misogeriya xwe bitené yan jî ya teveya malbaté gerentî bike, dema tu misogeriya famîlé bi giştî çébike, wé wexté hetanî zarok mezin bibin û temené wan bibe 25 Salî, yan jî dest bi kar bikn ew misoger kirîne.

Li Elmaniya geleg ciyén Misogeriyé hene, Navenda Xerciyé ya Baden-Württemberg (Verbraucherzentrale Baden-Württemberg) ciyé şéwirdariyé heye wé alîkariya we jibo hilbijartina ciyé rast bikin. Hun bi xwe dikarin di Interneté de tevan bidin ber hev.

Sozeké bi ciyekî misogeriyé re li gorî neqandina(hilbijartina) xwe çékin û bi xwe herin wir û şéwiré wergirin.

Bihayé salane yé Misogeriya Berpirsiyariyé ji 25 heta bi 90€ ye.

Ji Internet agehdariyén li ser derfetén misogeriyé ji xwe re wergirin!